

DÎHA

folklorame



## SPAS JI BO ALÎKARÎYA WAN

Aydin Batur
Ayhan Bozkûrt
Beroj Mukrîyanî
Bîlal Guldem
Bîrgun Uzûm
DÎHA
Ferhat Arslan
Jîyan Ozkan
Mûrat Adiyaman
Orhan Tanhan
Zeynep Yaş

TÊKILÎ
folklorame@gmail.com
folklorame

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsîyar e.


**Kovara folklorê ya sê mehane**
**Sal:** 3
**Hejmar:** 13
**Xwedî:** Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer
**Berpirsa Nivîsan:** Gevrîye Atli
**Edîtor:** Eşref Keydanî
**Redaksîyon:** Evîndar Şevîn - Kafûr Seçîlmek
**Desteya Weşanê:**
Celîlê Celîl
Bêrîvan Matyar
Elîf Gunduz
Mem Mukrîyanî
Zîya Mukrîyanî

**ISSN:** 2667-6443

**Grafîk:** Ali Gümüşel
**Fotoyê bergê pêş:** Orhan Tanhan
**Fotoyê bergê paş:** Zeynep Yaş

**Navnîşan:** Weqfa Mezopotamyayê
Mezopotamya Eğitim Bilim Sanat Sağlık ve Kültür Vakfı
İktisadi İşletmesi
Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok
Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır
**Sertifika No:** 42382

**Çapxane:** Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti.
Orta Mah.Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa-İstanbul
Tel: 0212 612 95 59
**Sertifika No:** 16919




## Pirtûka pêşnîyazkirî

**Navê pirtûkê:**
Dîdarok û Qewlikên Zarokan

**Berhevkar:**
**Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl**

**Weşanxane:**
Weşanên Wardozê

Di vê pirtûkê da 689 dîdarok û qewlikên zarokan û 76 şîret-qesîde hene. Keresteyên vê pirtûkê di salên 1970yî da hatine berhevkirin. Di dîdarok û qewlikan da hêvî, hesret, çoş, hezkirin, şîret hêmanên sereke ne. Hinek jê rasterast zarok dibêjin, hinek ji bo zarokan tên gotin. Berhevkirina vî cureyê zargotinê gelekî zehmet e. Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîlî bi keda salan, bi bêhnfirehî ev qewl û beyt berhev kirine.

"Hîvê, hîvê
Zengilzîvê
Dîya min şorbe çêkirîye,
Para hîvê bîr kirîye."

"Navê min, navê te,
Kumê min serê te
Bireve, ez bidim pey te."

# Naverok

5 Ji edîtorî
6 Hin vegêranên hirçê ji Serhedê, **Şeyma Orhan**
12 Dilo, **Celîlê Celîl**
15 Paşayê bajarê Adîyaman Feysel Paşa, **Mem Mukrîyanî**
30 Çav di zargotinê da, **Bahoz Baran**
35 Çeqçeq Paşa, **Mîr Mûhargînî**
40 Xanîyê birê min, **Eşref Keydanî**
42 Meftûne, **Şehrîban Matyar&Emîn Ozdemîr**
44 Elik û Fatike, **Surya Human**
53 Îsê Delan, **Yûsif Hêşetî**
62 Bawerîyên Herêma Mişarê, **Kurdjan Sorî**
71 Hesoyo newrek, **Mehmet Olmez**
74 Deyîrê meşkî, **Faruk Çetînkaplan**
76 Du arif, **Mehpûs Serhedî**
78 Eyşa keçel, **Aydin Batur**
81 Girara binerdikan, **Xecê Bîşeng**
84 Hin lihevanînok ji Devera Licê, **Payîz Tûrsûn**
85 Dîk û pîrê, **Asmîn Ûyanik**
87 Pîrê û dîko, **M. Seîd Temel**
89 Qor 'Ehmed Begê Mîrê Kela Boşatê, **Rêdî Seîd**
100 Çîrokeka mehkûmî/qaçaxîyê ji Farqînê, **Hebîbe Polattag**
106 Morîstana zer, **Zeynep Yaş**
110 Danasîn û nirxandina “Folklora Kurdî”yê, **Evîndar Şevîn**

# Ji edîtorî

Eşref Keydanî

Xwîner û bendewarên folklorê, niha hûn xwe bi xwe dibêjin, "Îsal, ne berf hat ku em kêfxweş bibin ne jî Folklora Me hat ku em pê dilgeş bibin." Nebarîna berfê, ne di hikimê me da ye; lê derneanîna hejmara payîzê, ya me ye. Gilî û gazindên we li ser çavan, me qebûl e. Hûn kêr, em penîr. Lê belê dinya ye, hesabê mal û sûkê pirî caran li hev nayê. Em jî divên ku deranîna hejmaran bi derengî nekeve, lê mixabin ji ber kêmbûna nivîsan me nekarî hejmara xwe ya payîzê derînin. Heçko kurd havînan dikevin ber pêlên kêfxweşî û betlaneyan yan jî li gundan dikevin nava karûbarên gundewarîyê û ji nivîsînê dûr dikevin. De bila ev gotinên dilsoj li vir bimînin, em nedin dûv tiştên çûyî û em bibêjin, ser xêrê û pîroz be hejmara nû.

Di qada folklorê da karên ku bihên kirin zehf in, çapkirina kovar û pirtûkên folklorê yek ji wan karan e. Di van du sê salên dawîn da, ji alîyê weşanxaneyên cuda cuda ve bi têra xwe berhemên folklorê tên çapkirin. Weqfa me jî, hewl dide ku ligel kovarê, pirtûkên kursîyerên me çap bike. Berîya niha du pirtûk me çap kiribûn. Vê dawîyê me sê pirtûkên kursîyerên xwe çap kirin. Pirtûkên 'Rostemê Zal û Selmanê Sindî', 'Çîrokên Rovîyan', 'Senem Xanim'ê berhevkarîyên ji sehayên cuda cuda bûn. Em berhevkar Wîldan Sevîm, Rênas Xendekî û Cemîl Çelîkî pîroz dikin û di xebatên wan da serkeftinê ji wan ra dixwazin. Em hêvîdar in ev her sê pirtûk bi dilê we bin.

Herweha em bi çapkirina van pirtûkan nesekinîn, me di navbera dîrokên 5ê Çirîya Paşîn û 24ê Kanûna Pêşîn da, kursa perwerdehîyê ya bi navê "Kursa Folklorê û Edebîyata Gelêrî" li dar xist. 23 kursîyer ji vê perwerdehîyê derbas bûn û dê di encama hin nirxandinan da, sertîfîkayên wan yên kursîyerîya folklorê bihên dayîn. Di qada folklorê da, ev kursa perwerdehîyê ya çaremîn bû. Bi vî awayî em hem dixwazin berhevkarên nû li qada folklorê zêde bikin hem jî dixwazin vekolerên nû li sehaya folklora kurdî xebatên cur bi cur bikin.

Di tûrikê me yê îcar da 22 nivîsên curbicur hene. Ji van nivîsan çar bi zaravayên kirmanckî, heçî yên mayî bi kurmancî ne. Ji nivîsên kirmanckî yek heye stranek e (deyîr) ku berîya 30 salî hatîye qeydkirin û çapkirina wê bû nesîbê me. Dîsa berhevkarîya Celîlê Celîlî ya 34 sal berê li Rojavayê kirîye cihê kêfxweşî û serbilindîyê ye. Di vê hejmarê da jî me du guhertoyên meseloka/çîroka "Pîrê û dîko/Dîk û pîrê" li pey hev dan ku her yek ji wan li herêmeka cuda hatîye berhevkirin. Me li pey hev dan ku xwînerên me bi çavên serê xwe bibînin; du çîrokên bi heman navî dikarin ji hev cuda bibin. Berhevkar Rêdî Seîdî hîkayeyeka gelêrî ya balkêş ji zarê Dengbêj Ayhanê Sipkî tomar kirîye û pêşkeşî me kirîye. Yûsif Hêşetî şêwirmend û şîretbêjê vegêranên gelêrî yê Hekarî û Behdînanê -Îsê Dêlan- ji nava toz û gemara jîyanê deranîye û bi me daye naskirin. Berhevkar Şeyma Orhan, Habîbe Polattag, Emîn Ozdemîr, Mehmet Olmez, M. Seîd Temel, Rêdî Seîd, Faruk Çetînkaplan nivîskarên kovara me yên nû ne. Rêya wan vekirî be.



Xwarina we meftûne, vexwarina we ji Germava Cirnîyê be. Cehd ji me, mirad ji Xwedê.

Ferhat Arslan

# Hin vegêranên hirçê ji Serhedê

Şeyma Orhan

Hirçê serê xwe kulekê ra dixe hindir, gazî Xecê dike, dibêje:

“Xecîce
Hevîr piçpiçî
Gede mal da bihecî.”

Royek dudu sisê hirçê her êvar tê serê xwe kulekê da dike vî şiklî, gazî Xecê dike.

